

TĀLAMOD

RAGIRTIN



XELÎL DIHOKÎ

TÅLAMOD

RAGIRTIN

av

Xelfl Dihokí

i tolkning av

Felix Valé

© Xelfl Dihokí, Felix Valé

Tryck Eskilstuna stads- och  
länsbibliotek 1990

## TÅLAMOD

Min bror, du vet  
att någonstans i världen  
är barnens tallrikar  
fulla med stenar  
Och på sluttningarna  
där gräset växer om våren  
dit får de fattiga  
med sina får och getter  
inte ta sina djur till bete  
Och någonstans  
där folket bygger sina hus med svett  
där säger fienden till dem  
"husen ni bygger är åt oss  
ni måste försvinna"  
Men trots all grymhet  
                    all brutalitet  
                    all hunger  
har de ändå tålamod  
har de tålamod...

## RAGIRTIN

Erê bira te zaniye,  
L'hindek qolaçên cihanê,  
Qazanên xwrna zaroka  
D'tijî ber in!  
L'zîr û gira,  
Gîya bijare û buhar e,  
Lê kar û berxên hejara,  
Lê naçerin!  
L'cih û dira  
Demê xanya b'xuha enya xwe çêdiken,  
Bîyanî d'bêne xudan ,  
We bo me yên avakirîn,  
Hilon berin!  
Lê d'gel hemî  
Birsatîyê..  
Hejarîyê..  
Zordaî yê..  
Xwe radigrin.. xwe radigrin..

## FÅRAHERDEN

Du fåraherde  
jag kommer ihåg och jag vet  
hur i tysthet  
vargens käftar  
dödade får och getter  
och hur blod flödade  
Men du måste  
ännu en gång  
samla lammen och killingarna  
i dalgångarna  
Därför säger man:  
"Framgång är inte  
att aldrig misslyckas  
framgång är att kunna resa sig  
och försöka igen"

## ŞIVAN

Ho şivano  
Min li bîr e û min yê zanî  
Kanê çewa, ho b'bê dengî!  
B'devê gura,  
Pez mir û xwîn l'dûr te pengî!  
Lê ya fer e, careka dî,  
Mih û kara.  
Xir keye, zom û nizara.  
Çinku dibên:  
"serbilindî ne her hinde,  
mirov çî cara nekevît.  
belku hinde, demê d'kevît  
careka dî  
rabît û ji nû bibeziit."

## EN KURDISK ARBETARES HISTORIA

Broder  
du stålbröstade  
jag minns det som nu  
när du kom till fabriken  
med din tomma mage och dina hungrande barn  
hur de skrek åt dig: "Försvinn!  
vem vet vem du är?"  
Då visste jag, min arme broder  
att även du var hjälplös som jag  
Vad hade du väntat dig?  
Vad hade du hoppats på?  
Kommer du ihåg  
när Bekas vulkan hade utbrott  
och sade utan rädsla:  
"I tjugosju år jobbade jag för dig  
hade mitt eget vatten, min egen mat  
mina egna kläder  
jobbade i Iran och i Rum  
för din skull bröt jag benen"  
Och broder, du stålbröstade  
jag minns det som nu  
när dina ögon blev som stjärnor  
när din röst blev rytande  
och du blev som ett lejon  
och du sade  
jag är arbetare  
mina bördor är alltid sorgens  
min spade mot fienders ögon  
är kniven och spettet

Medvetenheten finns alltid  
om att vi måste väcka oss själva  
för att få bort förtryckarna  
därför att jag vill  
få bort vargarna och rävarna  
och få tillbaka  
de stolta lejonerna och tigrarna  
till våra skogar och berg  
och jag vill få tillbaka  
de fördrivna fåglarna  
och att de ännu en gång  
skall bygga sina bon  
Vi skall rena källorna  
från blodsugare  
och de torra, smala struparna  
skall åter läskas  
med det rena vattnet  
Vi skall slita och sprätta sönder  
förrädarnas och blodsugarnas stinkande magar  
Men broder  
du stålbröstage  
som är kronan  
över de fattiga människornas huvuden  
plötsligt har jag märkt  
att du försvunnit från mig  
men du har inte blivit döv  
och du har inte heller tystats  
för överallt från himlen ekar din röst  
över dem som är tysta, döva och stumma:  
"Ni får inte låta barnen vara hungriga!  
Det är inget liv att leva i rädsla  
det är inget liv, det är inget liv..."



## **DASTANA PALEYEKÊ KURD**

**Ho birao.  
Sîng pîlao.  
Weku nuha, bîra min d'êt,  
Dema tu hatiye karxanê,  
B'zikê vala û zaro d'birsî.  
L'te jî d'xurîn, here, here,  
Kî dizanît tu çi kesî!?  
Hingê kekê jar min zanî,**

Tu jî mîna min bê kesî!  
Tu çî d'xwazî, tu l'çî d'pirsî!  
Erê ma te ne li bîr bû,  
Deme volkana BÊKESÎ (1)  
Peqî û digotî bê tirsî:  
"bîst û hewt sale min rênçberî tum,  
be nan û aw û cil û bergî xum.  
xizmetim kirdî le ÎRAN û RÛM  
Le pê nawî tu şikawe estum..."  
Lê birao. sîng pîlao.  
Weku niha bîra min d'êt  
Gava te çav bûyne dû stêr.  
Te deng bûye hurmênek û  
Tû bûye şêr.  
Rast te gotî:  
Ez pale me.  
Barê min tev cara xem e.  
Mera min j'bo zile çavên tev dijminan,  
Kêr û çeçok û kelem e.  
Bizava min ya herdem e.  
Her ya fer e xwe hişyar kîn.  
Zilm û sitem karyê rakîn.  
Lewra min d'vêt  
Gurg û rîvya rateqînîm.  
Şêr û pilingên meydana,  
Vezivînim gêrê dîsa.

Kew û kevok û mirîşka,  
J'mişextbûnê vegerînim,  
Carek dî hêlîn û lisa.  
J'tev kanîya,  
Ramalim kirim û zêrîya.  
Gewrîyên jar û têhnîya  
J'qirqîçînê, j'hişikbînê.  
Av bidim carek dî dîsa.  
Bipeqînim, bidirînim.  
Genî zikên noke û xwînmeş û pîsa.  
Lê birao  
Sîng pîlao  
Taca serê tev jarao  
Min hind dît tu l'min berze bûy.  
Lê ker nebûy.  
Bê deng nebûy.  
L'hemî layên asmanî dengê te veda,  
Gelê bê deng û ker û lal,  
Nekin zaro b'mînin bîrsî..  
Ne çî jîn e ya ku dibûrît bitîrsî..  
Ne çî jîn e.. ne çî jîn e..

(1) Helbestvanekî bî nav û deng ê Kurdistanê Iraqê ye.

## FEODALHERRARNA

Feodalherrarna byggde  
ett hinder för vattnet  
i min by  
de trodde  
att alla grödor skulle torka  
att alla grödor skulle dö  
men de glömde  
att det finns många källor  
utanför vår kära by  
att källorna är många  
att källorna är många

## DEREBEG

Derebega l'ser rûbarê,  
Gundê min sikir çêkirin.  
Hizir kirin.  
Tev cinîk dê j'têhnê mirin.  
Lê j'bîr kirin.  
Ku li dûrên şenge gundî,  
Kanî d'pirrin..  
Kanî d'pirrin..

## ETT MEDDELANDE TILL FÖRENTA NATIONERNA

"Efter att man slaktat fåren  
flår man dem  
men idag i mitt hemland  
flår de oss i fångelset  
innan de dödar oss"

Ja, ni som kräver friheten  
och freden och lugnet  
Vet ni det?

Det är känt i vårt folks historia  
att i mitt hemland  
dumma åsnor och kalvar  
härjar och förstör  
och fortfarande klagar de  
I dalgången Zflan på torget Çarçira  
grävde de ner tusentals människor  
och fortfarande klagar de  
I Sorya och Dekä  
eldar och skjuter de  
Fängelserna är fulla  
men vårt folk  
ger inte upp sin kamp

Skynda er!

Vad letar ni efter?

Blodet som strömmar?

Var och när?

Den gravida kvinnans mage sprättas upp  
för nöjes skull

Var och när?

Människor begravs levande

Var och när?

I stället för gåvor  
skickas napalm och bomber  
till våra barn

Därför: bland människoliken  
i de brända skogarna  
i de raserade husen  
letar jag efter friheten  
Det viktigaste är att gå framåt  
men jag tror  
att det skall komma en ny dag för oss  
en ny vår då källorna porlar  
På bergens toppar  
och där vägarna börjar  
skall vi tända stora eldar  
Vi skall smycka Kurdistan  
och vi skall krama om det  
och vi skall fira Newroz-dagen  
från hjärtats djup  
Då skall vi också fira er  
och de förtryckta folkens dag  
Vi skall fira!  
Vi skall fira!

**AGAHDARÎYEK JI BO CIVATA  
MILETÊN YEKGIRTÎ**

"Piştî pezî serjêdikin,  
Digurên û kevil dikin.  
Lê evroke l'welatê min,  
Berî mirovî bikujin,  
D'zîndana de kevil dikin." (1)  
Erê gelf daxaskerên serbestiyê  
Yên aşî yê û tenahiyê  
We ditîye?  
Dîroka milletê me jî bihistîye!  
L'welatê min, ker û golika,  
Gêre d'kirin.  
Nûha d'zirin.  
L'gelyê ZÎLAN (2) û ÇAR ÇIRA (3)  
Hizaran xelk, bin ax kirin.  
Hêştê d'nirin.  
L'SORYA (4) û DEKA, (5)  
Sotin. Gulebaran kirin.  
Zîndan d'pirin.  
Lê xelkê me,  
Şenge doza xwe bernedan,  
Xendek, çeper çol nekirin.  
Pa dê werin!  
Hûn l'çi digerin!  
Xwîn ya pengî.



L'kirê û kengî,  
Zikê jina avis bi şert,  
D'êt dirandin?! (6)  
L'kirê û kengî,  
Mirov b'saxî d'êt veşartin?! (7)  
L'kirê û kengî,  
L'şûna diyardên sersala,  
Napalm û top,  
J'bo zaroka d'ên hinartin?!  
Lewra gelo  
D'nav kelexên mirovan de..  
D'nav daristanên sotî de..  
D'nav xanîkên heraftî de..  
L'azadiyê ez digirim.  
Her ya fere pêşde herim.  
Lê bawer im.  
Rojeka nû wê j'me ra bêt.  
Buharek û kanî bizêt.  
L'serê gir û kupên çîya  
L'serên rîya  
Agirekê geş hîlbikîn.  
Kurdistanê bi xemlînîn, himbêz bikîn.  
Nevrozekê ji dil bikîn.  
Cejna hewe û xelkê jêrdest,  
Pîroz bikîn.  
Pîroz bikîn.

(\*) Destkariya vê helbestê hatiye kirin, hinde rûdanên din ji çûne di nav rêzên wê de.

1) Ji helbestvanê ercb EBDULWEHAB BEYATÎ hatiye wergirtin.

2) Li geliyê ZÎLAN, hizaran xelkê bê deselatê sedan gunda kom kirin û di vî geli de bi destên cendirmên Tirka hatine bombe barankirin û şehîd kirin, dibêjin: Rûbarê di geli de diçû pir xwîn bûbû.

3) ÇARÇIRA, di vê meydanê de serokê Komara Muhabadê, QAZÎ MUHAMMED û hevalên wî bi destên ri-jêma ŞAHÊ gor bi gor hatine bidardakirin.

4) Sorya, gundek e dikevîte devera BEHDÎNAN li nêzik bajêrê ZAXO. Li sala 1963 hukumeta faşîsta Îraqê, gişt xelkê gundî, ku ji felch û musulmanên kurd pêk hatibû, hemû gule baran kirin

5) DEKA, şikeftê e, dikevîte devera BEHDÎNAN nêzik bajêrê ŞÊXAN, gişt xelkê gundî ji ber top û firokên hukumeta hov revibûn û çûbûne di şikeftê de. Lê kirêgirte û leşkerê holakoy agir berdane şikeftê û hemû tê de şewitandin.

6) Piştî sala 1960, jineka kurd kefte destên leşkerê Îraqê, ji ber ku jin aviz bû, lewre şertanê kirin da ku bizanin, ka jinê kur heye ya keç!! Hovane armanca xwe cê bi cê kirin.

7) Piştî salên 1960 li bajêrê SILÊMANÎYÊ ji heştê mirovan pêtir girtin û bi saxî havêtine di çaleka kûr de û veşartin.



Xelfî Dihokî, f 1951 i Kurdistan, Irak, kom till Sverige 1987. Han har utgivit flera böcker i såväl Sverige som Kurdistan, både sagor och dikter. Denna översättning är gjord till en poesifestival i Eskilstuna med poeter från olika länder. Översättningen gjord utav undertecknad i samarbete med Firat Karababa.

Eskilstuna augusti 1990

Felix Valé



